**Ev pirs û bersiv li gorî agahiyên planaWezareta Perwerdahiyê, Lêgerîn û Ol’an ji bo têkiliyek baştir bi malbatên penaberan û zarokên ku li Yûnanîstan’ê re hatine amadekirin.**

**Gihîştina perwerdahiya fermî a li Yûnan, penaberan mecbûr nake ku li Yûnan bimînin. Perwerdahiya ji bo zarokên penaberan heta zarok li Yûnan’in heye û ev ji bo berjewendiyên zarokan e , ji ber ku perwerdahî aramî û nîzamê dide zarokan. Û dîsa gava ku zarok ji Yûnan biçin wê belgeya beşdarbûna perwerdeyê wê bidine wan.**

Bi gihiştî ji bo tomarkirina zarokên penaber li dibistanan berpirsiyar Wezareta Perwerdahiyê ye. Ji bo tomarkirina zarokan belgeyên wan kêmbin jî (Bibîne: *http://www.minedu.go.gr/eidiseis/22034-04-07-16-gia-tin-eggrafi-allodapon-mathiton-me-ellipi-dikaiologitika-stin-defterovathmia-ekpaidefsi*).

Malbatên ku ji bo tomarkirinan zarokan ji bo dibistanê hemî belgeyên wan kom nekiribin jî, gerek zarokên xwe li dibistanan binivisînin û wê Wezareta Perwerdahiyê wan biparêze.

Ji bo ku zarokên penaberan li polên nu ê serê sibê werin bicîhkirin, malbat kanin herin ba midûrên dibistanan û bi wan re bipeyivin. Wezareta Perwerdahiyê wê di nêzîk da dibistanên ku hatine hilbijartin ji bo polên nu li gorî hereman li hemî Yûnan wê eşkere bike.

## 4 Zarok çi wext kanin dest bi perwedahiyê bikin ?

Tomarkirina ji bo polên nu ê berêvarê, wê gav bigav di 10’ê Cotmehê da dest pê bike.
Di demikî nêzîkda wê Wezareta Perwerdahiyê wê agahiyên zêdetir bide malbatên zarokan.

Tomarkirina ji bo polên serê sibê, ji bo zarokên li heremên cûde û li nava bajaran vê gavê vekiriye. Wê wezaret di demike nêzîkda kîjan dibistan kanin polên nu bihewînin wê eşkere bike.

Ji bo zêdetirên agahiyan li vê malperê bigerin:
*http://www.minedu.gov.gr/ekpaideusi/refug-educ*
û dîsa li malpera: *info-refugees-education@minedu.gov.gr*

Personelên ku li avahiya mêvantiyê kar dikin, e ku pirsên wan hebin an jî hewceyê desteke bin, ji bo malbatên zarokên penaber kanin bi Koma Yûnanî ji bo Karên Perwerdahiyê bi rêya malpera: *eswg.greece@gmail.com* re bikevin têkiliyê.

Ji bo hevkariyê spasiya we hemiyan dikim

MIJDAR 2016

HELLENIC REPUBLIC
Ministry of Education, Research and Religious Affairs

PRINTED BY:
unicef

*Picture Credit: © UNICEF/Ergen/2015*

# GIHÎŞTINA PERWERDAHIYÊ


AGAHÎ JI BO PERSONELÊN AVAHIYÊN MÊVANAN Û JI BO MALBATÊN PENABERAN



1

# Mafê kê ji bo perwerdahiyê heye?

## Bêferq hemî zarokên li Yûnan mafê wan û beşdarbûna perwerdahiya dibistanê heye.





**Tenê şert'ê ku ji bo zarok tevlî dersan bibin hewceye zarok hatibin aşlekirin û ji bo derzî kirina zarokan berpirsiyar Wezareta Tenduristiyê ye.**

Armanca asta ewil a bernameya wezaretê a perwerdahiyê ji bo zarokên ji 4 salî heta 15 salî ye û şandina wan a dibistanên ji dibistana Mader heta dibistana Navendî mecbûrî ye.

Armanca plana wezaretê ewe ku 18.000 zarokên penaber û koçberan ku di temenê dibistanên mecbûrî da ne, wan bigrin dibistanan (ev ji %14' de nifûsê zarokên Yûnan ku li dibistanan e). Ji bo zarokên penaberan tevlî pergela perwerdahiya Yûnan bibin, du tercîhên wezaretê henin. Tercîha yekem a ji bo zarokên penaberan ku li avahiyên demî ku dimînin, a duyemîn ji bo zarokên penaberan ku li heremên cûde li navendên bajaran dimînin, wek kesên ku ji bo bernameya vecihîkirinê hatine bi cîh kirin, ên ku li xanî ya hatine bi cîh kirin, li otêl'an û ên ku li navendên daxwazên îlticayê û ji bo zarokên bêkes.

### ZAROKÊN KU LI AVAHIYÊN VEKIRÎ MÊVANTIYA DEMÎ DIMÎNIN




**Zarokên ji 4 salî heta 5 salî***
mafên wan hene herin dibistanên Mader, ev dibistanana wê li nava avahiya vekirî mêvantiya demî da werin avakirin.

**Zarokên ji 6 salî heta 15 salî****
wê li polên piştnîvro ê nuhatinê ku di navbera saet 14:00 heta 18:00 li dibistana fermî ku wezaret berpirsiyare wê werin tomarkirin. Li dibistanê wê dersên zimanê Yûnanî wek zimanê duyemin, zimanê Ingilîzî, matematîk, werziş-spor, huner û kompyuter bidin ber wan.

Rêxistina Navnetewî a Penaberan (IOM) wê zarokên penaberan ji avahiyên vekirî mêvantiya demî bi otobûsan bigrin bibin û bînin va dibistanên hatine hilbijartin ji bo perwerdahoyê û endamên (IOM) wê di çûyin hatinê da bi zarokan re bin.

### ZAROKÊN KI LI HEREMÊN CÛDE LI NAV BAJARAN DIMÎNIN



**Zarokên ji 4 salî heta 5 salî**
kanin wan li dibistanên Mader ê fermî tomar bikin.

**Zarokên ji 6 salî heta 15 salî**
ku li heremên cûde li nav bajaran dimînin , kanin herin dibistanên nêzikî mala xwe û li polên serê sibê ê dibistanê xwe tomar bikin. Ev dibistanana ji aliyê wezaretê da vê gavê tên tespîtkirin . Ji bo zarok li hemî dibistanên hatine hilbijartin werin belavkirin û dîsa di navbera polên nu ku ji bo zarokên penaber û koçberan ,ku zimanê Yûnanî wê wek zimanê duyemîn wê were hînkirin.

* Li gorî pergela dibistanên Yûnan û biryara wezaretê a nu.
** Li gorî pergela dibistanên Yûnan û biryara wezaretê a nu

ZAROKÊN 4-5 salî

ZAROKÊN 6-15 salî

# Kî bernameya perwerdahiyê amade dike?

2

**Wezareta Perwerdahiyê Lêkolîn û a Ol'an ji bo plankirin û birevebiriya perwerdahiyê berpirsiyar e.**




Rêxistinên NY (UN), rêxistinên navnetewî ê din û saziyên sivîl ê dilxwaz bi sertifîka ya Enstutiya Perwerdahiyê kanin bernameyên perwerdahiyê nefermî bi kar bînin. Ji bo zarokên ku dibistan mecbûriye, ev bernameyên perwerdahiyê tenê di roj û saet'ên ku dibistana fermî tuneye kanin pêk werînin. Ji bo bernameyên perwerdahiyê nefermî , piştî destûr girtinê kanin li avahiyên dibistanên fermî da pêk werînin û dîsa ji bo perwerdahiya zarokên temenê wan bi ser 15 salî re û kesên ji bo kesên bi ser hîjdesalî re jî.

Wezareta Perwerdahiyê ji rêxistinên NY(UN), rêxistinên navnetewî ê din û saziyên sivîl ê dilxwaz hêvî dike ku li avahiya vekirî mêvantiya demî û li dibistanên perwerdahiya ji bo penaberan, perwerdahiya ji bo dersên zimanê dayîkê, ji bo perwerdahiya kesên temenê wan bi ser hîjdesalî re plana perwerdahiyê bi kar bînin û hêjmara «navberyên çandî» zêde bikin.

# Pêvajoya xwe tomarkirinê kîjan e?

3

### JI BO ZAROKÊN LI AVAHIYA VEKIRÎ MÊVANTIYA DEMÎ DIMÎNIN PÊVAJO EV E:




Kordînatorên perwerdahiya penaberan a navendên mêvantiyê ji bo dibistanên ku zarok biçin û ji bo çûyin û hatina zarokan a dibistanê wê bi berferehî malbatên zarokan agahdar bikin.

Kordînatorên perwerdahiya penaberan ji bo çûyin û hatina zarokan a dibistanê bi otobûsan wê belgeya ku malbat desturê dide bixwazin û va otobûsan Rêxistina Navnetewî a Penaberan (IOM) peyda dikin û endamên wan ê hilbijartî wê zarokan bibin dibistanê û bînin.

Kordînatorên perwerdahiya penaberan ew belgeyên ku ji bo tomarkirinê hewce dikin (mîna: qerta îlticayê, deftera tenduristiyê, dîplomayen ku li welatê xwe girtine û qebûlkirina belgaya ji malbata zarokan ji bo çûyin û hatina dibistanê) ji bo hemî zarokên ku li navenda mêvantiya demî dimînin berhev bikin.

Kordînatorên perwerdahiya penaberan va belgeyên li jor hatine berhevkirin wê bide berpirsiyarên ji bo tomarkirina zarokan li her dibistanë.

### JI BO ZAROKÊN KU LI AVAHIYÊN VEKIRÎ MÊVANTIYA DEMÎ DA DIMÎNIN, LÊ LI HEREMÊN CÛDE LI NAVA BAJARAN DA NE (statûya parastinên cûde di nav da) PÊVAJO EV E:




Malbatên zarokan hewceye zarokên xwe li dibistana herî a nêzikî herema xwe tomarbikin.

Ji bo tomarkirina zarokan li dibistanê hewceye sûretê qerya îlticayê a zarokan, deftera tenduristiyê, dîplomayên ku ji welatên xwe anîne û hwd.

Ji bo tomarkirina zarokan li dibistanê beyanameya xanî ji malbatên zarokan tê xwastin, wek navnîşana xanî, yên ku di avahiyên mêvantiyê da dimînin an jî peymana/delîl a ji bo mal/xaniyê hatiye kirêkirin.

Ji ber rewşa penaberan, daxwazên îlticayê û kesên koçberên din, belgeyên wan ji bo tomarkirana zarokan këmbin jî, wê werin qebûlkirin. Midûrên dibistanan haya wan ji viya heye û wê destek û alikariyê bide ji bo tomarkirinê.

Ji bo zarok li dibistanê bikeve dersan,hewceye deftera tenduristiyê ji ba doktorên zarokan û belgeya ku xwiya dike ku zarok hatiye aşlekirin-derzîkirin bînin. Wek ku li jor hatiye gotin, ev tiştên ku hatine xwastin këmbin jî, midûrên dibistanan wê alikariyê bidin ji bo zarokan.

Dîplomeyên zarokan ji welatê ku hun jê hatine tên qebûlkirin, lê gava ku ev belgeyana kêmbin jî midûrên dibistanan wek li jor hatiye gotin wê tevbigerin.